# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (234):

## Gundê "Sariya" - guhertineke demografî, Cindirêsa wêranbûyî, rawestandina rakirina bermayan, geregoşî û dizînin ji alîkariyan re, piroseyin niştecîkirinê
















Di qiziliya xişimûbêtara erdhejê ya mirovane ya mezin a ku bi ser herdu welatên me de hatiye, Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê siyasetên xwe yên dijîtiyê û qirêj li dijî Kurdan di Sûriyê de ji bîr nakin, wan nehîşt alîkariyên ku Rêvebiriya Xweser li Bakur Rojhilatê Sûriyê şandine derbas bibin (ên ku neh rojan li Derbasgeha "Um Cilod" - Minbic seknandî mane, ji Roja Çarşemê /8/ê Reşmehê ve), weke hewildanekê ji bo kûrkirina cudakirinê di nav Kurdan û yên bi ser ve de, bi ser de jî ew di vê kirîzê de bi erkeke xwe jî di tenga herêmên ku desteser dikin de ranebûn, û hîn Efrîn dorpêçkirî jî hîştin; Herweha hewil didin niştecîyên Cindirêsê yên resen jî bi aliyê çadirgehên komelane yên dûr ve koçber bikin, û milîseyên xwe yên nandoz jî

têvedidin ku bi hemî reng û şêweyan bindest bikin, bi nijadperestî bi wan re bidin bistînin, û wan ji bingehên jiyanê bêpar bikin.

**= G. "Sariya":**

Bi Navça Mabeta ve girêdayî ye, /12/KM ji navenda wê dûr e, ji dora /80/ malî pêkhatî ye, dora /500/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, di dema dijberîkirina li ser herêmê de tev penaber bûn, jê dora /23 malbat = 75 nişte/ vegerîn û yên din zorane hatin koçberkirin, û dora /30 malbat = 180 nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Bi sedema topebarankirina gund ji aliyê Artêşa Turkiyê û milîseyên wê ve di dema dijberiyê de, mala Hemwelatî "Ednan Xelîl Mistefa" bi tevayî hate roxandin, û /12/ mal jî ziyanên têvel gihîştinê.

Milîseyên "Lîwa'i El'muntesêr Bîlah" gund desteser dikin, ên ku ji malan xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, amûr û alavên elektirîkê û hinên din dizîne, û herweha jî tevahiya heyînên hundir malên ku dest danîne ser, heyînên dîkana "Beşîr" ya pêdiviyên malan, tirektoreke çandiniyê ya "Idrîs Elî Hacî Hesen", giropeke zayenda elektirîkê ya "Elî Ce'ifer Sîdo", guheztok û keblên toreya elektirîkê ya giştî û keblên xeta serekîn a ku dere gund.

Wehajî milîseyan dest danîn ser dora /3500/ darên zeytûnê yên xelkê gund, 40% vêrgiyan li ser berhema werzên malmewdanên yên ne li gund û 10% li ser malmewdanên ên li wir ferz dikin.

Û wan dora hezar darî zeytûnê bi rengekî bêwijdan ji bo êzingkirin û bazirganiyê qut kirin, û weha jî wan ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzên binerd û dizîna wan kinzan, bi serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê cîgeheke Rojhilatê gund û Girê "Xaziyana" yê hevcîwar kolan.

Weha jî xelkê li wir mane rastî cureyên têvel ên binpêkirinan hatin, mîna revandin, girtina bêsûcane, işkencekirin û peresitandin û yên bilî wan.

**= Bajarê "Cindirêsê" yê wêranbûyî:**

Li Başûr Rojavayê Bajarê Efrînê bi /20/KM û li ser cîgeheke erdnîgarî yevdûz dikeve, berî dagîrkirinê ji aliyê Turkiyê û nandozên wê ve li destpêka sala 2018an. Z, hejmara nişteciyên bajêr gihîşte dora /35/hezar nişteyî, tev di encama topebarana mekin de penaber bûn û ziyan gihîşte piraniya malan, ji wan tenê dora /15/ hezar nişte vegerîn û yên din jî zorane koçber bûn, û dora /45/ hezar nişte ji malbatên anîndeyan di malên dest danîne ser de hatin niştecîkirin, da ku rêjeya Kurdan têde ji dora 90% dakeve kêmtirî 25% - li gor guhertineke demografî ye rêbazkirî, û milîseyên ku bajêr desteser dikin "Ehrar El'şerqiyê, Ceyş Ek'şerqiyê, Feyleq El'şam, Ehrar El'şam, Nûr El'dîn El'zenkî" dest danîne ser malmewdanên xelkê ne li wir, û vêrgiyan li ser berhemdanê werzên çandiniyê ferz dikin.

Ew li /6/ Reşmehê li dû erdhejê rastî hilweşandin û wêrankirineke giştiyane hat, 70% ji avahiyên wê nema rûniştin têde dibe, bi taybetî ku beşek jê di encama topebaranê de ji ber hev ketibû û lawaz bibû, û ji ber hilweşandinê hejmara miriyan gihîşte /1100/ kesî - li gor serjimara "Encûmena Cindirêsê ya Xwecihî - 17.2.2023an. Z", jê dora /260/ ji nişteciyên Cindirêsê yên resen in - li gor serjimareke taybet.

**= Bermayîn û birîndar:**

Avahiyên li ber roxandinê li Bajarê Efrînê û bi dehan gund û bajarokan bi hewcî hilweşandineke lezgîn in digel rakirina bermayîn û gilgemara komserhev bûne û di wextek din de ji nû ve avakirinê ne, û bi taybetî jî li Bajarê Cindirêsê, lê hemî aliyetên hene kar nakin û rawestî ne;

Herweha birîndar û yên seqet bûne hewcedarî dermankirinên berdewam, neştegêriyê, pêşkêşkirina dermanan û pêdiviyên girîng in, bi taybetî yên seqet jê, bi ser de jî xwedîlêderketina li zarokên sêwî û mişextberan.

**= Fîxanî û alîkariyên mirovî:**

Hemî kesên ziyan ji erdhejê dîtine û yên qeza bi seriyê wan hatine bi hewcî fîxanî û alîkariyên mirovahî yên berdewam in, û ta niha bi hezaran ji wan li derve mane û bê cî ne; Li gor daxuyana "Wezareta saman/malî û aboriyê - Hikometa Sûrî ya Demkî" - 16.2.2023an. Z, /313/makînên baran ji alîkariyên mirovî di Derbasgehên (Hemam, Bab El'selamê û Girê Sipî) re derbasî Bakur Rojavayê Sûriyê bûne, lê bi dehan

rapor û bînerdayênên li ser erdê û nûçeyên bi taybet ji me re tên tekez dikin ku piraniya kesên ji niştecîyên resen û ziyan ji erdhejê dîtine ji wan alîkariyan bêpar in, ji bilî hindikiyê ku di riyên taybet re digihêje wan, û pêleke ji anîndeyên Efrînê û çadirgehên Idlibê yên ku ziyan ji erdhejê nedîtine hatine orta bajarê Efrînê û derdora Cindirêsê, û di kongehên çêkirî de rûniştine -piraniya malbatan jî di bêtirî konekî de rûniştine - da ku tibabeke mestir ji alîkariyan werbigirin û carna jî ji makînan bidizin û li tîpên belav dikin bixin, û encûmenên xwecihî û aliyên ku ew alîkarî dane lawaz in û nikanin bi rengekî dadmend belav bikin, di siya geregoşiya rêvebirî û desteserkirina çekdarane yê milîseyên têvel de, ewên ku yekser di geregoşiyê de pişikdariyê dikin, dest datînin ser beşekî mezin ji alîkariyan, beşekî jê didizin û yê mayîn jî li ser yên bi ser xwe ve belav diikin.

Lê Kurd karên weha li xwe danînin û di têvedana hevdû û geregoşiyê de ne pişikdar in, û hin jê neçar dibin bi pereyên xwe yên taybet çadir û hewcedariyên xwe bikirin.

**= Pirojeyeke niştecîkirinê:**

Ji bo kûrkirin û pihêtkirina guhertina demografî, Destlatên dagîrker niştecîyên Cindirêsê yên resen bi aliyên penaberiyê û rûniştina di çadirgehên komelîn de têve didin, û dema ew konan û alîkariyan daxwaz dikin li ser wan merc dikin ku herin çadirgehan, ji bo ku mal û mewdanên xwe seyb ji milîseyan re bihêlin, ewên ku li fersendekê digerin ku ew ji malên xwe bi dûr kevin da ku heyînên mal û dîkanên wan bidizin, û herweha jî ji bo bajêr ji niştecîyên resen vala bikin û rê li pêş avakirina bajarekî niştecîkirinê li şûnê ji niştecîyan re dûz bikin.

Û ji aliyekî din ve "Gundê Qeterî 2" yê niştecîkirinê yê nimûneyî, li 12.2.2023an. Z hate vekirin, bi beşdariya "Eqîd Mubarek Şerîde El'ke'ibî - serkêşê giropa El'qeterî ya navdewletî ya giropa lêgerîn û rizgarkirinê ya girêdayî hêzên asayêşa hindirîn" -yê ku seredana Cindirêsê kiriye- û "Mihemed El'casêm" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah"; Ew ji aliyê "Komela Şam El'xeyr ya mirovahî" ve û bi pereyên Hikometa Qeterê hate avakirin, li Cîgeha "Lêçe" nêzîk Gundê "Çeqelê Jêrin" - Navça Şiyê, ji bo niştekirina /200/mal ji anîndeyan têde, di çarçewa pilaneke wênekirî û fermî di navêna hikometên Turkiyê û Qeterê de.

Û ji aliyê xwe ve serokê cîbicîker ya dezgeha "Qeter a Xêrxaziyê" Yûsêf kurê Ehmed El'kewarî li 12.2.2023sn. Z di perçevîdyûyeke belavkirî de li ser rûpela dezgehê li ser Tiwîterê ragîhand, ku asta yekê ji piroseya bi navê "Bajarê El'keramê" - bi behaneya ji nûve avakirinê - weke bajarekî niştecîkirinê yî nû û têde /600/malbatên anîndeyên ku hatine Efrînê werin bicîkirin bi rêket.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Hin bînerên ku li Bajaroka "Kefersefrê - N.Cindirêsê" bi çavan dîtine hewal dan ku çawa alîkarî ji aliyê Milîseyên "El'semerqend" ve hatine dizîn, û hema dema makîne gihîştine derbasgeha wê anînde li dorê kom bûne û alîkarî wergirtine û tîpekê jî wêne jêre girtine - weke ku xelkê bajarokê bin- û yê din jî xistin embarên "Semerqendê", bê ku bidin niştecîyên Kurd ên resen.

**-** Di hefta borî de û piştî erdhejê, milîseyan dest danîn ser beşekî mezin ji fîxaniya xelkê Efrînê ya ku ji wêranbûyên Cindirêsê re hatibû şandin, û rêbenda çekdar a Milîseyên "Feyleq El'şam" li Gundê "Tilsilorê" - Başûrê Cindirêsê li Roja sisiyê ji erdhejê piraniya barên alîkariyan -dora/30/makînên pîkab- ên ji xelkê gundên "Bircebdalo, Xezîwê, Basûtê û Kîmarê" ve hatibûn şandin bi zorê ji xwe re birin.

**-** Çekdar û anîndeyên dest danîne ser malên hemwelatiyên Efrînê razî nabin malekê ji xwediyan re -yên ku bi sedema erdhejê hilweşîne û xwedî pê daxwaz dikin- vala bikin û vegerînin.

**-** Li 11.2.2023an. Z, Destlatên Dagîrker Endezyarê Çandiniyê "Azad Bîlal/55/sal" û Hemwelatî "Şiyar Kemal Ebdî" bêsûcane girtin, û li roja din berdan.

**-** Li 14.2.2023an. Z, dema ku makînên alîkariyên " Saziya Xêrxaziya Berzanî" gihîştin Cindirêsê, komeke mezin ji anîndeyan êrişî ser kirin da ku alîkariyan bidizin, û Milîsyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" qurşîn bi banî de avêtin daku wan belav bikin, û tîpa saziyê -bi ser ku berê xwe da encûmena xwecihî jî- nikanî alîkarî li ser ziyandîtiyên rastîn parve bikira.

**-** Li 14.2.2023an. Z, du çekdaran ji Milîseyên "Ceyş El'îslam" mekin li Hemwelatî "Îmad El'dîn Zênel" keyayê Gundê "Tulifê" - Efrîn xist, bi sedema seknandina wî li kêlek hemwelatiyekî gundê xwe û

daxwazkirina valakirina mala wî ya ku dest danîne ser, piştî ku ew bi sedema erdhejê neçar bû ku Bajarê Efrînê berde.

Ta niha Herêma Efrînê ya dagîrkirî dorpêçkirî ye, derbasgehên wê bi herêmên R.X re - Rojhilatê Ferêt û herêmên di bin desteseriya Artêşa Sûrî de nehatine vekirin, û Destlatên dagîrker rê nedan derbasbûna alîkariyên ku ji R X ve hatine şandin, weke binpêkirinekê ji zagona mirovahî ya navdewletî û belgeyên navdewletî yên girêdayî rewşên xişimûbêtar û mafên mirovan bi giştî re.

19.02.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Maleke koçeberbûyî û hatiye dizîn li G. "Sariya" - N. Mabeta.
**-** Maleke ziyandîtî di encama topebarankirina G. "Sariya" de, li sala 2018an. Z.
**-** Dizîna guheztok û keblên toreya elektirîkê ya giştî, li G. "Sariya".
**-** Cindirêsa wêranbûyî.
**-** Vekirina gundê niştecîkirinê ya nimûneyî "Gundê Qeterî 2".